



Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988



Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yê netewî di çarçewa yekîtiya wellêt de .

Ji weçanên *Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ*
Email : Newroz95@hotmail.com

Hejmar (79)

Nîsan

2008 z-2620 k

Buha (15) ps

Li Qamişlo şeva Newroza 2008-an

Li hinde kolanên taxa Rojava li bajarê Qamişlo roja 20 ê Avdarê li dora kat 6:30 ê êvarî , bi sedan xortên Kurd li hev civiya bûn , li ber agir û mûman bi aştiyane û dilên şa govend û dîlan digerlandin . Yekcar , ne di bîr û xeyala wî xelkî de bû , ku weha ji nedîve agir bi ser wan de bibare û şahiya wan bibe şîn û girî .

Bi destên hêzên karbidesta dewletê , sê xortên camêr têne kuştin , dibine qurban û şehîdên Newroza xwe û dora dehan jî birîndar dibin . Yê birînkûr digihên nexweşxanan û yê ku, birînen wan sivik li malan û di nêv hev de dihatin dermankirin . Tevî ku birînen hemiyan ên qurşînen zindî bûn. Û tê gotin ku ne tenê yê zindî bûn , lê belê yê domdom bûn jî .

Ev bûyera he , ya kirêt û hovane , derhal bi telîfonan li seranserê herêman li nav Kurdan dihat belavkirin û dibû ciyê xemgîniyê .

Bi dawiya wê şevê re , berpirsiyarên rêxistinên Tevera Kurd a Sûrî karîbûn li hev bikin , bi helwesteke hevpar daxuyaniyeke siyasî ji raya giştî re bidine belavkirin , û tê de vê kiriyara

hovane şermezar bikin û ji xelkê Kurd bixwazin ku, şahiyên Newrozê li Sûriyê û li derve bêne rawestan û şînê bikşînin bi hawê nederketin û reşgirêdanê .

Belê , bi xemgîni û melûlî xelkê Newroza îsal derbaskiribû . Lê, bi sedan rêxistin û hêzên siyasî , mirovhez û mafparêz , dengên xwe bilindkirin û gotin **Na** ji vê ton kiriyarê re li dij Kurdan li Sûriyê , û karbidestên berpirsiyar dihatin rûreşkirin . Ji bilê gelek qenalên Tilifizyon û malperên Entirnêtê ku, diheştin nav û dengê hebûna pirsê Kurd li Sûriyê bi xurtî bête bihîstin û piştgirî pê re riya xwe bibîne .

Rastiya pirsê ew e ku , diltengî û çavsoriya desthilatiya rijîma Be'is li beramber cejna Newrozê her diçe bêtir dibe , tirseke mezin dikeve zikê wan karbidestan . Lewre jî , bi her hawayên diyar û nediyar dikin û dixebitin ku , ev cejna Kurdan ya salane bête herimandin , bibe cî û sedema şîn û xemgîniyê , şahî ji holê rabe , dengê mûzîk û strana kurdî nekeve guhan , xelk li ser hev kom nebe û necive , destan nedin hev û Newroza hev pîroz nekin.

Sînorê Yekta

Newroz	Hejmar (79)	Rûpel (2)	Nîsan	2008z – 2620k
Nûçe	û	Çalakî	Nûçe	û Çalakî

Ji çalakîyên Nîsanê

Li 17. 4 . 2008an , roja Pêncşemê , derdora nîvro , giropek ji rêvebirên Danezana Şamê (Îlan Dîmeşq) di nav de şandek ji Partiya Yekîtî ya Demokrata Kurd li Sûriyê bi boneya cejna Celaê , seredana gora welatperwerê xebatkar ê mezin ê Kurd Ibrahim Henano kir . Di wê seredanê de , baxek gul û kulîlk bi navê Danezanê dînan ser gora wî nemirî , û hin gotin hatin pêşkêşkirin.

Seyrana xwendekarên zanîngeha Helebê



Careke din bi hatina heyva Nîsanê , geşbûna Buharê û xemlandina zemîn û asîmanê bi çiçek , gul , ro û perwanê ; rêxistina xwendekarên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê seyrana navendî ya zanîngeha Helebê li darxist . Di 11/4/2008 an de xort û keçên Kurd berê xwe dan gundê Celemê û li ber gola gund , li rex kaniya wê seyraneke bedew û binefş derbaskirin . Dora 6000 kes li seyraneke beşdar bû , û tev dîlanên Kurdî , reqs û semayên xweşik , çepik û lîliyên bilind , awazên evînî û netewî bi dengên hunermendên gewre mîna : Zekeriye dilcan , Osmancan , Canboro , Cîhan û Newroz û tev semayên komên Zanîn û Cûmê seyrana Buharê xemilî û bi awakî qenc û aştiyane li darket . Hêjayî gotinê ye ku, destlata Sûriyê xwest vê seyrane

kulek bike bi beşdarbûna hejmarekî mezin ji şaxên parastinî . Lê, mixabin viyana hevalan ji çiyayên nerindiya wan

bilintir bû û seyran mîna newrozekê hate şênkirin . Sipasîk mezin ji bo hevalên **P.Y.D.K.s** , û sipasîk taybetî ji xelkê me yê gundê Celemê û Cindirêsê re em bi rêdikin .

Ji weşanên nû

Pirtûka

Efrîn Ebre Elisor

Ev pirtûka ji afrandina mamoste Merwan Berkat e . Bi zimanê erebî û şewakî hêsan hatiye rêstin . Derhênan û çapa wê baş e . Ji (462) rûpelan , qetê orte pêkhatiye . Ew dabeşî ser (8) deriyan bûye . 1- Cîgeha Ciyografî (navlêkirin) . 2- Xwendinek ciyolocî ji herêma Efrînê re (Çiyayê Kurmênc) . 3-Efrîn ji sedhezarsal ve , herêma hêminî ya ademîzadiyê ye . 4- Çiyayê Kurmênc (Efrîn ebre elisor eltarîxiyê) . 5- Êzdî li Çiyayê Kurmênc – Dîroka wê . 6- Hin cîgehên bermayî li herêma Efrînê . 7- Çandinî . 8- Herêma Çiyayê Kurmênc , herêma gerkêşan û seyrankêşanê ye .

Çend pelên dawiyê jî yên navnîşanên sereke û şaxeyî yên pirtûkê , û jêderên bi kêrî wê hatine re ne . Û di rûpela dawiyê de jî , berhemên erebî yê xwediyê vê pirtûkê hatine xuyakirin . Di dawiya rûpela dawiyê de gotinek nirxbuha ji gotinên ramangîr Îmad Elesfehânî cî girtiye .

Em bi navê desteya birêvebirina weşana Newrozê , sipasiya mamoste Merwan Berekat dikin , hêviya berdewamî û pêşketinê jê re dixwazin , û gurzek gulên rengîn û bînxweş jê re diyarî dikin.

Newroz	Hejmar (79)	Rûpel (3)	Nîsan	2008z – 2620k
Nûçe	û	Çalakî	Nûçe	û Çalakî

***Li** bajaroka **Tirbespiyê**, du şevbuhêrkên çandî ji bal giropa Çanda Kurdî li Tirbespiyê ve hatin lidarxistin. Di hundurê herdu şevan de, du gotar hatin xwendin, yek li ser dîroka Kurd û rola wan di avakirin û afirandina şaristaniyê de bû. Birek rewşenbîr û hezkerên wêje û çanda kurdî lê amade bûn, guftûgo li ser vê rewşê bû. Li ya, din mamoste **Hesen Biro**, fêrdanek li ser rola sazûmanên ne dewletî di berga parastin û berxwedanê de pêşkêş kir.

* **Ji** çalakiyên Komîta Dicle ya Fêrkin û Parastina Zimanê Kurdî, lidarxistina hin korsên zimên, pileya alfabê li **Tirbespî , Dêrik , Rimêlan û devera Aliyan**. Di encamê de ezmûn ji wan re hate pêkanîn û yên bi serketî, fêrname wergirtin. Digel xelatkirina şagirtên ku, durvên bilind wergirtibûn. Hêjayî gotinê ye, ku hê jî gelek kors berdewam in.

***Bi** helkeftina cejna cîhanî ya jinê, gelek komcivîn li bajarê Dêrik Rimêlan, Tirbespî, Girkê Legê û devera Aliyan hatin lidarxistin. Di wan de, fêrdaneran li ser rewşa pîrekê bi giştî û ya Kurd bi taybetî û rola wê di xebata milletê me yê Kurd li Sûriyê de, rawestiyên û şîrove kirin. Û di wan kocivînan de hin xelat li pîrekên ku bi rolek baş di warê kar, çand û civakê de lîstine hatin belavkirin .

* **Li navça Efrînê.. bazareke nû...Wekî** ku nas e, li her devereke navça Efrînê bazareke hefteyî heye, gelek pêdviyên kesan, malan û karûbarên gundiyan lê tên danîn. Li roja sêşemê 4ê meha Adarê 2008an, bazareke hefteyî li gundê Be'dîna jî hat damezrandin. Birastî, ew tiştê erênî û sûdar e, şênîyê gundê Be'dîna û hemî gundên derdorê pê şabûn û ew hêvîdarin ku ranewest e û berdewam bibe.



Pîrozbahî

Cejna NEWROZÊ li we pîroz be, bila hemî demên we Buhar û Newroz bin. Hêvîdar in ku li gelê me bibe Buhar, tîrêjên ronahiyê dîwarên reşî û zordestiyê hilweşînin, û ken vegere ser lêvên zarokên bê guneh yên ku bi agirê hovîti û zikreşiyê tene sotin. Gul, kulîlk, sosoin û binefşên welatê me bi serbestî serê xwe hildin, li ber awazên bayê Buharê bi mestî xwe bihejînin..!

Careke din lome ji Tevgerê!!

Li Newroza îsal, li nijadperestan qirêja û xwîna merovên Kurd rijandin. Tevahiya Sûryê di daxuyaniyeke Sûryê xwastin, ku lidar nexin û reşiya

Li ber ronîya wê komîteyên çalakiyên Kurdî li Sûryê rawestandî û bê aheng

Lê belê, ew biryara Kurd ve, bê helwestên tûj jî derbas nebû. Hemî cotariyan de bigre û di di nav wan axaftinan de xuyan kirin.

Pirs li her derekê jî ev bûn: *Biryara Gereke Newroz biba lê standina biryarê de bi re negotibe Newrozê biryarê hat, millet lê hersal dewlet karekî Newroza me ji holê*

Jixwe her pirsekê şax çepûrast li derbarê kesên li ser îmze kirine

Birastî jî, çiqasî bike û xwe ji rêberên nikane xwe ji ber wan alî. Ji ber ku ew di serê

Lewre ne gengaz e, ne egerên rêberên partiyên

û xwe ji ber bersivan bidin alî. Emê di van çend rêzan de, li bersiva pirsek din jî bigerin, ew jî ew e: *Gerek ji ber çi sedeanm, em kanibin mehrecana Newrozê rawestînin?* Ez guman dikim, ku ev pirs dê ya herî bingeîn be û bersiva wê, dê bersivên gelek pirsên din **D.R(10)**

Li sereta, , bêguman xwîna ciwanemergên me, netenê ji ber mafên gelê Kurd de tê rijandin.. na! Ew ji ber hemî gelê Sûryê ve şehîd dikevin. Ew ji ber serbestiya merovê Kurd û Sûrî ve canê xwe didin. Lê pirs, pirs qedandina bihaya ew xwîna pak di ustûyê me hemiyan de ye. Ji me tevan tê xwestin, ku ew xwîna pak jibîr neb. Dênê wê di ustûyê me de ye, ew dên jî bi qedandina azadiyê tê vedan. Qelengê wê azadî û serfirazî ye. Bila xwîna ciwanemergan di dilê me hemiyan hilde, û hêviya jiyaneke azad û civateke dadmend peyda bike û vejîne.

şeva 20.3.2008an, dîsa serê wan yê genî bêhin dan, li Qamîşloka jiyandar partiyên Tevgera Kurd li hevbeş de, ji gelê Kurd li ahengên cejna Newrozê pakrewanan girêdin.

biryarê, ji bilî PKK/PYD, Newrozê, li hemî navçeyên amadekariyên xwe û şahî derbas bû.

Tevgerê ji hêla lawên gelê têvel, gengeşe û lomeyên tofên gelê me, ji şivan û ba xwendevanan re derkeve, geriyan û helwestên têvel

mîna hev bûn, yên giringtir *Tevgerê rast bû lê şaş bû? na? Rêberên partiyên di kê şewirîn? Ma kesî ji wan mekin!? Vehesa Kê ji dewlet? Guman tuneye, ku wilo çepel bike û bi demê re rake? Û H.W.D*

jî jê dikşên û gotinên sedemên standina biryarê û jî dibûn.

mirov xwe hişmend û bêlan partiyên re mirûd bibîne, ew pirsên mafdar û rewa bide piraniya gelê me de hildida

jî ji siyaseta û hişmendiye me guhdarî gelê xwe nekin

Sebah Elxeyr Ya Xanim

Tu jî gelekî bixêr, Zûbyer Salih..!

Dîlan Zivingî

Dengbêjê hêja û delal , Zûbeyir Salêh, Piştî rêz û silavan: Dema em guhdarî stiranên we dikin , ew dengê xweş û zîz bi hestekî hunerî nazik û tenik li guhên me dikeve . Nemaze ew stirana **Sebah Elxeyr ya xanim** , hestê evîne li rex mirovan vedijîne û mirovan ji jiyana xem û qisawetên rojane bi dûr dixîne, ev reng û sitîlên stiranê mirovan ber ve jîn û jiyana bav û kalan dibe, ku lawên gelê kurd yên mîna nemir Meleyê Cezîrî yên ku ,xebata xwe di riya wêje û helbestan re nîşan didin pir kêr û hindikin ,wan ji zû ve bi dengê bilind û gelekî xurt diyadikin û destên xwe dane ser birînê ku tu kes bê evîn nikare rûyê jiyane yê xweşik û pir şêrîn bibîne, jan û dijiwariya demê bipejirîne . Ev li hêlekê û li hêla dinê , ev stiran bi çoşekî pir bilind li hevdu hatiye hunandin, çi mizûk , deng , wêje û h. w.d be ,digel tabiloya sitiranê bi wêneya keça xweşik û nazidar **Leyle Bedir-xan** ya pêşî ji keçên kurd ku, sema û reqisa balê ye , wê bi bejin û

Li - 7-ê Avdarê û li bajarê Helebê , bi boneya cejna jinên cîhanê, ji hêla rêxistina jinan ve ya partiya Yekîtiya demiqurat a kurd li Sûriyê [Yekîtiya] ahengek hate li darxistin , bi reqis û sema, çepik lîlî û bi dengê herdu keçikên xweşik û nazdar Nêroz û Mîdiye ve ew ahenga dihate xemilandin . Qaserî -33- jin bi navê parityê hatin xelat kirin . Bi vê boneyê , -8- Avdarê li jinên Cîhanê nemaze li jinên kurd pîroz be .

Nûçe

bedena xwe ve em bi jiyana û dema malbata Bedir-xaniyan ve dibirin, ku heyf û mixabin ew malbata ji hêla bêbextên tirkan ve, bi hovîti bê sûc û guneh penaber û mişexite kirin , wisan jî ew li hin dewlet û deverên biyanî cîwar bûne , vêca jî wan pir cefakêşî dîtine . Lê, ew bi tu carî ji xebata xwe nemane , di warê zimanê kurdî de bi rêkûpêk xebitîne û pir berhem weke sermîyan ji me re hêştine . Lewre jî, îro em tev deyndarên nemirên mîna Celdet Bedir-xan, mîr kemîran û meleyê Cezîrî û h.w.d ne . Vêca jî em hêvîdar in ku win li ser wa riya hunerê, ya di strana **Sebah Elxeyr ya xanim** de xebata xwe bajone serî, bi vê awî û bi ya me be , bêgûman winê bi serbilindî cihekî bêlikirî di nava civakê de bigirin .. Li dawî jiyana û duhatiyêke xweş û serkeftî ji we re hunermedê hêja hêvî dikin, digel gurzek gulên renga-reng yên Buhara çiyayê kurimênc diyarî we û xwendevanên rojnama NWEROZ dikim û dibêjim roj baş hunermendo.. Welato.. Bavo.. Jîyano..

Li Qamişloyê, Newroza Kurdan Bi xwîn û keser derbas bû...!!

Rêberê Silivî

Êvara cejna netewî ya Kurdan (NEWROZ), di wê dema ku ciwan û gencên Kurdan bi helkeftina hatina cejna xwe ya pîroz li kastînekê ji kastînen bajarê Qamişlo dîlan dikirin, ji nişka ve, hêzên tariyê, hêzên mirinê, yên asayîşa dewleta Sûriyê, berê guleyên xwe yên malmîrate bê şerm û bê fihêfî dane singa wan ciwanên bê guneh, sê xort ji wan li qadê bê can mane, û sê gul weriyane...!! hine din jî birîn bûne...

Belê, wisa bi erzanî, bi xwîneke sar û cemidî, xwîna lawên me di cejna wan a netewî de rijandin. Şûna ku di vê cejnê de ew selikên gul û çiçekan pêşkêşî welatîyên xwe yên Kurd bikin, di cejna wan de dilê wan bi jiyane xweş bikin, bingeha biratî û yakîtiya netewî xurt û asê bikin, mirina reş li Kurdan belav kirin, dilê wan di cejna wan de melûl û xemgîn kirin...!!

Sibeha Newrozê, Kurdan reş girêdan , bi beşdariya cemawerekî mezin digel serokatîya tevgera kurdî li Sûriyê, termê hersê pakrewan li ser milan hate danîn, bi gul û çiçekên xemilandî, bi duruşmên mîna **Şehîd Namir e!!** ew di xaka bav û bapîran de li mezelê Hilêliyê hatin veşartin.

Bi rastî, di vê heyamê de, tu rijîm nemane ku, bi devê tivingê bi gelê xwe re dipeyivin , û tu rijîm tune ne bi vî hawî tîkiliyê bi welatîyê xwe re dikin...!! Ma gelo bi kuştin, girtin û lêdanê dozên gelan çareser dibin?... Ma gelo, bi van ton tîkiliyan çavên gelan tê şikandin û doz bincil û winda dibin?... Ma gelo kuştina welatîyên bê sûc û bê guneh nişana mîrxasiyê ye?..

Divê aqilmendên vê rijêmê(ger hebin) li xwe û pîrsa kuştina Kurdan vegerin, lêkolîneke berpirsiyar çê bikin, bi zelalî encamên wê eşkere bikin, û kesên biryara kuştina Kurdan dane cezayê xwe bibînin. Ji ber ku, ew mirov yan wî aliyê fermana

kuştina Kurdan daye, ewê rojekê fermana kuştina welêt jî bide...!! Ew kesên ku di Avdara sala 2004an de fermana kuştina Kurdan dabûn, dîsa ew in yên ku, îro fermana kuştina me dane. Ê eger ew li ber dadgehan ranewestin û bêhna mirinê nekeve pozê wan, her ewê fermanên kuştinê biafirînin, her ewê kîn û zikreşiyê di civaka Sûriyê de belav bikin...

Şoven û kîndarên ku ev ferman dane, mebesteke wan a sereke heye, ew jî di baweriya me de ewe ku, doza Kurd li Sûriyê ji naveroka wê pûç û vala bikin, dozê ji raya giştî ya Ereb re bidin xuyakirin her weku dijminatî di navbera Kurd û Ereban de heye, kurd dixwazin Sûriyê digel welatîyên wê daqurtînin...!! , û bi her hawî ew dixwazin ku rikberî û dijminatî tîkeve navbera Kurd û Ereban û rastî di bin toz û dûmanê de winda

bibe...Lê, Kurd û Ereb jî bi vî bend û davê, bi vî plana rûreş dizanin. Wan tucarî ev şaşîfî nekiriye û wê di paşerojê de jî nekin. Ji ber ku, her kes dizane dozeke kurd a dadmend û rewa li ber destê karbidestên welêt heye, û çareseriyê dixwaze. Biraderên Ereb,

Asûr, rewşenbîr, hezkerên demokrasî û berevedêrên mafên mirovan ji doza birayên xwe yên Kurd re piştgir û alîkar in.

Rêz û silav ji giyanên pakrewanên Kurd re, serê gelê me sax be, tendurustî ji birîndaran re, û azadî ji girtiyan re. Em hêvîdarin ku, Newroza bê li ser gelê me bi kêf, ken be, û gelê me yê Sûriyê bi tevayî, bi hemî neteweyên xwe ve di rewşeke çaktir de be. Ê her bijî Newroz, sembola azadî, mirovatî û wekhevîyê.

Mihemed Hisên



1991-2008

Mihemed Zekî



1989-2008

Mihemed Xelîl



1981-2008

NE DÛR E

M . Şêrewî

Careka din cejna azadiyê, bi ala hêrsa Kurdayetiyê bejna berbanga xwe xemiland, bi rengê sor navê xwe li eniya demê nîgarkir. Belê ... xwîna pakrewanan pertavên rojê bi rengkirin, û di îşqa rojê de tîn berdan.

Karwanên şehîdan li goristanên Kurdistanê dîlanên azadiyê gerandin, lîlîyên dê û yadan asîmanê bê 'ewir qelaştin, dijminên mirovatiyê bi destên xwe yên qirêj hîzala rûmetiyê bi sextîperestiyê lewitandin , pêlên tengijandinê, sînorên dademeniyê rasteçep leqandin û hejandin.

Li şeva cejna azadiyê, agirê Newrozê ... agirê Kawayê hesinkar, xelata xwe diyarî xwedê kir û li ser wê xelatê di nav du kevanan de hatibû danîn (Ey xweda sê Pakrewan bi navê pêxemberê te Mihemed ji bo aşî û azadiyê bûne qurban) .

Belê... Mihemed Mihemed û Mihemed bi tacên sorgulî serên wan hatine xemilandin. Li bejna wan kesk û sor û zer wekî keskesora Buharê pir lihevhatî bû. Dêmên wan yên nîşana azadiyê vedidan û radimûsandin. Roja bîst û yekê Avdarê bereniyê wê ji tariya berê şevê bû, stranên xemlandina zavan şahîka dahîk û silopanbûn. Ta bi Lal û ker û Kûran, bi lep , deng li hevdû vedigerandin û digotin : Newroz aşî ye.... Newroz dademendî û wekhevî ye, Newroz azadî ye, û Şehîd namr e.

Belê... Ey Mihemed... Ey Mihemed...û ey Mihemed , li roja cejna Kurd û Kurdistanê, ji Qamîşlo

bajarê evînê ta Kobanî û bajarê aşiyê Efrîna delal keç û xortan, jin û mêran, pîr û kalan reş girêdan. Kenê şahiyê di dêmên xwe de qurmiçandin, navên we sê Mihemedan li ser eniyên xwe nivîsandin, li cihên mihrecanên newrozê ji bo canên we nimêja kêferatê kirin û strana Şivan perwer (Ey şehîd şehîd) kevir û zinarên çiyayê Kurmêç bi girîdikirin. li seranserî Kurdistanê dêmên Kudperweran şîn dipijikandin, ji çavên ciwan û egidan birûskên berxwedanê dijenîn, û kela dilê wan agirê Newrozê gurdikirin. Li gund û bajarên, ji sê pakrewanên Newrozê re, Kurdan bejna xwe ditewandin, û sirûda Ey Reqîb diyarî goristanên pakrewanan dikirin.

Belê... ey sê Mihehedên azadiyê... sê pakrewanên Newrozê..

Kurdan şîn û şahî dane berhev, bi reş sipî restrin.

Hiş û dil dane berhev, li ser alên reş navên we danîn.

Kurdan kul û derd li bîra xwe anîn, di rûpelên Avdarê de, navên we jî ji zêr danîn.

Ey pakrewanên newrozê...

Ey şehîdên azadiyê...

Ey Mihemed, Mihemed û Mihemed... ji bîrnekin diyariya koma pakrewanên Hîroşîma Kurdistan, bêjine wan, îro Helebçe azad e, ji bîrnekin ew diyarî.

Ne dûre... na ne dûr e , rojekê diyariya we jî wê ji were bê.

Rojnamegeriya kurdî, Buhara Çolbistanê xemiland .

Rîportac : Nûnerê Newrozê

Di vê sala ziwa û bê Buhar de, partiya me, partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (Yekîti), karîbû gul û kulîlkên çanda kurdî, di bin konê rojnamegeriya kurdî de bicivîne. Da ku ew rengên xwe yên bedew, û bîna xweş belav bikin û riya gelê me yê Kurd ronî bikin.

Di roja 18ê miha Nîsanê de, li devera **Çolbistan**, herêma Dirbêsiyê, koma **Ronahî**, û **komîta çalakiyên kurdewarî**, bi çalakiyên xwe ev roj xemilandin, û bi pêşkêşkirina gotinên rewşenbîran, stranên dengbêjan yên mîna Lîloz, Îsam Ebbas û Itidal, û helbestên helbestvanan ev roj bêtir zengîn û têr kirin.

Nûnerê Newrozê ev kurte dîtî bi hin ji mêvanên vê ahengê re kirin :

* **Mamoste E.Hemîd Derwêş:** Sekretêre partiya Demokrata Pêşverû li Sûriyê :Berî 110 salan, mîr Miqdad ev kovara Kurdistan derxist. Ez bejna xwe jê re ditewênim. Ji ber ev rojek bi nîşan e. Ez sipasiya partiya Yekîti ya Demokrat û ya weşana Newroz jî dikim. Bi rastî, rojnama kurdî gelek qels e, piraniya rojhilatê bê rojname ye û mîletê Kurd jî ji wan e. Gerek em vê rojê zengîn bikin, gotina min ne ji rojnamevanan bi tenê re ye. Lê belê , ew ji hemî rewşenbîran re ye. Gerek çand û nivîsandina xwe pir bikin û guhnedin gotinên ne di cî de, û gerek em arîkariya belavkirina çanda şaş nekin. Em partiyên Tevgera Kurd gerek piştgîriya rojnamevanan bikin .

* **Mamoste Gebriyêl Mûşê:** Endamê komîta rêzanî ya partiya Asûrî ya Demokrat : Rojnama kurdî gelek zengîn û têr e, çî ya çavkî û çî bihîstok. Ew dikare bi rolek mestir rabe, bi grêdana peywendiyên di navbera wê û hêmanên din de. Em bi hêvî ne ku ev rewş pêş de here. Ev berpirsariyeke ku me bi hev re girêdide, ji ber xalên gihandinê ji nakokiyên bihtir in. Nimûne, helbestek bi zimanê Siryanî di kovara Dicle de ya ku li Kurdistanê Iraqê tê weşandin derket, dilê me pir pê xweş bû. Di nerîna min de, girînge gavên wisa li vir jî bêne avêtin, û em rêza çanda hev bigirin. Li Sûriyê, rojnamevanî di tengasiyê de ye û gelek hevalên rojnamevan îro di zîndanê de ne. Ez dibêjim dengê bi tenê tucaran welat ava nebûne. Di vê helkeftinê de ez azadiyê ji wan re dixwazim, wek **Enwer Bunnî, Elî**

Elebdella, Firas Seed ..û gelekên din jî. Li dawiyê, ez daxwaza serkeftinê ji we û weşana Newroz re dikim.

* **Mamoste Yaqûb Derwîş:**(Yek ji girtiyên berê ye): Ez hêvîdarim ku, hemî kesên di Sûriyê de dijîn, dîrok, tore û rojnamevanîniya kurdî nas bikin. Lê mixabin, ta niha nerîn û doza kurdî hê di nav hin rêxistinên erebî de naskirî ye. Girînge têkilî fireh bibin. Gereke ew bibe dozeke niştimanî Sûrî, û her welatîyekî Sûriyê vê dozê nas bike. Rojnama Erebi xizmeta rewşa erebî ne kiriye ta ku, ew xizmeta ya kurdî bike.

* **Mamoste Quteybe Elhuseynî:** Bi hêvî me ku, guhdan li vê rojê bibe, da her yek bîr û baweriyên xwe bîne zimên. Îro, rojnamegeriyeke azad di Sûriyê de nîne, gereke em hemî yekdestbin, da em karibin ji bo doza welatê me hemiyan Sûriyê û ji bo doza Kurd xebateke hêja bi rêkûpêk bikin .

* **Mamoste Zeredest Mistefa** (Evokat û endamê komîta Maf): Îro roj em bi rojnamegeriya kurdî



serbilind in, nemaze ku em di rewşine zor û dijwar de derbas dibin. Niha, gelek qenal û malperên kurdî çêbûne, lê mixabin, li sûriyê azadiya gotinê nîne. Di gel vê yekê jî, ragihandina kurdî ji ya pir dewletên din yên ku ji dehên salan ve serxwebûna xwe wergirtine pêşkêştir e. Ez hêviya pêşketinê ji rojnamevaniya kurdî re dikim.

* **Mamoste M.Qasim** (Nivîskar):Ev roj di jiyana mîletê me de rojek pîroz e, ev roj, rola malbata Bedirxaniyan di çand û wêjeya kurdî de diyar dike, bê çawa di rewşeke zor û dijwar de, Mîr Miqdad

Dûmahîk r(11)

Ahenga roja cîhanî ya jinê li Dêrika Hemko

Rîbortac:NûşînBêcirmanî

Di roja cejna cîhanî ya jinê de, rêxistina pîrekê ya Partiya Yekîtiya ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ), li Dêrika Hemko ahengek li darxist û hin rêxistin û girûp beşdar bûn, ji wan:

-Girûpa Dêrikê ya çanda Kurd.

-Baxên jinên Dêrikê.

-Tevna Çand û Hunera Kurd li Dêrikê.

-Dad û Maf.

-Nûnerên partiyên Kurd li Dêrikê.

-Malbatên herdu pakrewanên Dêrikê.

Ahengê bi rawestaneke li ser giyanê pakrewanên Kurd û Kurdistanê dest pêkir. Paşê gotina P.Y.D.K.S. (YEKÎTÎ) ji bal hevalemê ve hate xwendin. Di pey re, ev gotin hatin pêşkêşkirin:

1-Gotina Partiya Çep ê Kurd ji bal endamê komîta rêzanî **Mehmûd Sefo** ve hate xwendin.

2-Gotina Tevna Çand û Hunera Kurd li Dêrika Hemko ji bal birêz **Narîn Omer** ve hate xwendin. Ew li ser cejna pîrekê û dîroka vê cejnê rawestiya, û herweha wê helbesta bi navê (Himbêza Pira Bafid) diyarî şevê kir, ya ku tê de dibêje :

Di himbêza pira bafid Te çû

xewnek belek danî

Li seqlanê te kon raxist

Veda dîlan bi botanî

Keçên dilsoz, ciwanên pak

Bihîstin wan civîn danî.

3-Gotna Dad û Maf ji bal evokat Ednan Çaço ve hate xwendin.

4-Helbestek ji bal rêxistina pîrekê ya Partiya Dimoqrat a Kurd li Sûriyê (elpartî) hate pêşkêşkirin.

5-Birûskek ji Girûpa Dêrikê ya Çanda Kurd gihişte şevê.

6-Helbestek ji bal **Asya Xelîl** ve bi zimanê erebî hate xwendin.

Piştê, koma Dêrika Hemko ya Folklorî bi hin çalakîyan rabû. Ji wan şanoya (QOÇO), û hin stranên xweş bi dengê hunermendê hêja **Îsam Ebbas** diyarî mêvanên xwe kir,

Li dawiyê, du jinên helbestvan û yeke xebatkar hatin xelatkirin ew jî ev bûn:

a-Narîn Omer (helbestvan)

b-Asya Xelîl (helbestvan)

c- Rehîma Osman Diya Azad

Piştî xelatkirinê, nûnerê Newrozê, herdu helbestvan dîtin , ev kurte hevpeyvîn bi wan re kir, û ev herdu pirsên han ji wan kirin,

1-Tu vê şevê çawa dinexînî?

2-Gotina te ji weşana Newroz re çiye?.

PÎROZ BE

Cejna Çarşema Sor, bi navê din 'Çarşema serê Nîsan ê' li gorî bîr û beweriyên civaka me, roja afirîna cîhanê, peydabûna xêr û bereketa axê ye. Çarşema Sor roja destpêka aşî û aramiyê ye. Xweza reng diguhere di wê rojê de.

Çarşema Sor, cejna civaka Êzdî ya herî mezin û watedare ku ji dîroka kevin ve wek Sersala Kurdî tê pîrozkirin.

Çarşema Sor, ji bo tevayîya gelê kurd çand, ziman û dîrok bi xwe ye. Ev cejin, nîrxekî gelê kurd e. Parastin û pîrozkirin ji mafê her kurdekî ye.

Dumahîk : Careke din...

Bide. Tevî ku, ta niha bûye çend car ku, ahengên Newrozê tên rawestandin. Lê belê, tu partî, tu rêxistin û hêzên Siyasî yên Kurd li Sûryê, bi şêweyekî berpirsane li ser rewşên ku, kanibin şahiyên Newrozê biskînînin, ranewstine. Em tev dizanin, ku, gelek cejin û boneyên gelê Kurd hene, lê roja îro, Newroz li ba gelê Kurd, bûye cejna gelêrî û netewî û ya herî gewre jî. Gel bi zorê û bi xwîna ciwanemergên xwe Newroza xwe vejandiye û diparêze. Ji ber wê jî, gava ku ew ji bo armancên siyasî yên teng û biçûk, yan qezencên partiyane, yan kesane were bikaranîn û ji hêla siyastvana ve dakeve mêzîna kar û zirareke ne hêja, ew tirsek îjdirî li ba cemawerê Kurd peyda dike, û bi çavê gumanê li biryarên lezok û gumandar tê nêrîn, û gelê me bi îjdirî li sedeman dipirse û paş wan vedide. Netenê wilo, rewşeke nakokiyê jî di navbera herdu aliyan, gel û partiyên Kurd de, peyda dibe û rêzdariya biryarên partiyên û tevahiya tevgerê dadigere. Ev jî tiştêkî zor bivehe, ji ber ku hêz û nixdariya Tevgerê ji nav gelê tê. Û eger dilsozî û bawerî di nav herdu aliyan de lawaz bibe, doza gelê Kurd zîyanê dê bibîne û helwesta dijminên azadiyê xurt dike. Ev rewş, û pirsgerêkên ku, ji biryarên rawestandina ahengên Newrozê peyda dibin, pêwîst dike, ku rêbertiyên Partî û Tevgera me ya siyasî, bi awakî diyar û xebatkarane li derbarê pirsê Newrozê rawestin û hîmên bingehîn ji lidarxistinê û lidarnexistina mehrecanên wê re nas bikin. Zor pêwîst e, ku sedem û pêwîstiyên sereke û navnîşanên qalîng ji rawestandina wê re werin naskirin. Ji ber ku, gava ku, ew eger werin diyarkirin, biryarên şaş dê pir hindik bibin, û hemî hêzên me yên Siyasî û li serê hemiyar cemawerê me, dê bi biryarên tvegera xwe bawer bibin û pê bikin.

Belê.. û zor pêwîst e jî, ku ew babet ji roja îro de were vekolan û naskirin

Dûmahîka rojnamegeriya

***M.Bavê Şino** (Çalakvan û siyasetmedar): Bi rastî, ev roj rojêke xweş û pîroz e. Dema em rewşên bîr, siyasetmedar û hemî çalakvanên civaka sîvîl dest bidin hev, em dikarin karekî hêja ji bo gel û welatê xwe bikin. Ez cejna hemî rojnamevan, rewşên bîr û xebatkarên azadî û aştiyê pîroz dikim.

***Ebdella Hac Eyûb**(Niştimanperwer):Ez rojnama kurdî pîroz dikim, kombûna rewşên bîran di ahengeke halo de gelek xweş e, û bi rastî ew ciyê serbilindiyê ye. Derbarê rojnamevaniyê de kêmasî hene, lê ,ew baş bi rola xwe radibin bo xizmeta doza kurd . Li dawî,ez pîroziya partiya Yekîtiya ya demoqrat dikim ku, ev roja pîroz ji me re li dar xist.

***M.E.helîm**(Rewşên bîr):Berî 110salan, ev berhema derketî gelek hêja ye, ya iliktronî gelek li pêş e , û xwezî ya nivîskî jî wilo be. Hêviya min ewe ku, yekîtiyek ji rojnamevanan re çêbibe.

***M.E.hekîm Mele Hacî**(Rewşên bîr) :Rojek pîroz e, û ev bûye cejnêk ji bo daneheva van rewşên bîrên Kurd. Hêviya min ewe ku, rewşên bîr berjewendiyê gelê xwe tim li pêş bigrin .

***M.şerîf**(Rewşên bîr):

Sipas ji weşana Newroz re ,û ji partiya Yekîtiya demoqrat re, ku van ahengan pêk tîne . Gerek tiştin heftiyane derkevin û nemînin heyva ne û bi keve aliyê niştimanî bihtir ji aliyê siyasî .

***M.Xalis Misewer**(Nivîskar):Ev kar ciyê sipasiyê ye. Dema rewşên bîr li hev dicivin, gerek em guhdariyê li hev bikin, rojnamevan bihtir bi rola xwe rabe ,û rola jina Kurd jî tê de hebê .

***M.Ehmed**

Ismayil(Şanoger):Rojnamegeriya kurdî di dîrokê de, di hemî aliyan de bi roleke mezin rabûye. Ez vê rojê li rojnamê û karmendên wê jî pîroz dikim. **ÇOLBISTAN**

Gotina Komîta Kovarên Kurdî Li Sûriyê di bîranîna roja rojnamevaniya Kurdî de

Di roja 22 ê Nîsana sala 2008an de, 110 sal di ser weşana yekemîn rojnameya kurdî(KURDISTAN) re derbas dibin. Ev rojname stêrka pêşî bû ku, rê li ber rojnamevaniya kurdî ronî kiriye.

Rojnamevaniya kurd li Sûriyê jî li ber vê roniyê pêkên pêşî avêtine. Lê mixabin, ta îro roj jî ew di rewşeke zor û dijwar de û di bin merc û hoyên awarte de dijî. Ev yeka jî ziyane dighîne ziman, çand û civaka kurdî.

Bi navê Kovrên kurdî li Sûriyê em dozê li nivîskar û rewşenbîrên xwe dikin ku ew ziman, wêje û kultûra xwe biparêzin, herweha jî dozê li rêjîma welêt dikin ku, zimanê kurdî bi rêdaneke fermî serfiraz û azad bibe. Û rê bide ku zimanê me di çerxa xwe ya durust de bigere.

Bi vê bûneyê, em pîrozbahîya rojnamevan, rewşenbîr, helbestvan,

Dûmahîka rojnamegeriya.....

rojnameya Kurdistan deraniye tîne bîra merov. Di vê rojê de hûn rewşenbîran dicivînin, û di vî warî de hûn gelekî li pêş in. Bi hêvî me ku, rihê partîfî ji jiyana wan derkeve, û ramyariya wan ligor berjewendiya Kurd be.

* **M. Rezo Osê** (Nivîskar):Bi ser ku baye û toze jî, lê rojeke pîroz e.Barek giran li ser pişta rojnamevanan heye. Li gor demê, mercên rojnamevaniyê hê ne di rewşek taybet de pêk tên .Meydanek serfiraz ji wan re divê, ev jî ji dewletê tê xwestin. Lê mixabin, hê ev tişt nîne ,da bi rola xwe bi serfirazî bilîzin .

* **Mamoste Hewas Mehmûd** (Nivîskar) : Ev rojeke pîroz e û gelek xweş e. Rewşenbîr ji hemî rengan tê de hene, û dan û standin di navbera wan de, bi rihekî biratî û dilşewat, çêdibe. Li hember êrîşa ku tê me, barê me pir giran e. Wisa jî ,gereke em karê xwe pêşbixin , nivîsandinan xurt bikin, û têkiliyan bi hêzên ereb re ava bikin. Sipasî ji wan re yên ku, ev aheng pêk anîne.

***M.E Ilah Elbaşa**(Nivîskar): Sipas ji malbata BEDIXANIYAN re ji ber ewan bingeha rojnamegeriya kurdî danî.Sipas ji Partiya Yekîtiya ya Demokrat re ji bo vî karî hêja ku, rewşenbîran di vê ahengê de dicivîne.Gerek em dengine din jî bibhîzin (Ez û Yê din). Rojnamevanên Kurd ji bo

hunermend û nivîskarên gelê xwe dikin. Bi hêvî ne ku, ew li pîrsa zimên û çanda xwe xwedî derkevin û parastina mafên serbestî û serfiraziya rojnamevaniya kurdî bikin.

Di vî warî de, em çilsaliya kovara Gulistan pîroz dikin, hêvîdar in ku, her ew bimîne stêreke geş û ronak di asîmanê wêjeya kurdî de. Herweha jî em derçûna kovara ZAR pîroz dikin, hêviya serketin û berdewamiyê jê re dikin û wê weku endam di nav koma kovarên kurdî de li Sûriyê dipejirînin.

*Silav û rêz ji giyanê rêberê rojnamevaniya kurdî Mîr Miqdad Midhet re.

*Silav û rêz ji bo hemî kes û aliyên di ber rastî û peyva azad de kar û xebatê dikin.

10.04.2008 Z- 2620 K

Komîta Kovarên Kurdî Li Sûriyê

gelê xwe baş bizavê dikin. Ez bi hêvî me , ne tenê di warê kurdî de bikin lê di warê niştimanî de jî kar bikin. Gereke ew dûrî hişkbûna netewî, olî û aydyolocî bibin.

***M.Imad Mustefa** (Rojnamevan):Roja derketina rojnama kurdî ya yekemîn , guhertinek kete peyva kurdî . Gereke rojnamevanên Kurd xwe pêş bixin. Ez dibînim ku, rojnama kurdî ya partiyan e.

***M.Sebrî Resûl**:Gelek kar li hêviya rojnamevanê Kurd hene. Daxwza min ji wan ewe ku, guh bidin alavên xwe û wan pêşbixin. Ji ber rola rojnamevanan ne kêmiya siyasetmedaran e.

***M.Zagroz** (Zimanhez):Ev rojeke pîroz e, hemî bizavên di aliyê rojnamevaniyê de tên avêtin lawaz in , û nekarîne vê rewşê bi hêz bikin. Sipas ji vê guhadanêre , li roja rojnamegeriyê .

***M.Şêrîn Kêlo**:Bi rastî, rojeke gelek pîroz e . Sipas ji kesên ku, ev roj li dar xistin e. Hêviya min ew e ku, rojnamevan di xizmeta pîrgirêka Kurd de bin , û ev şerê li ser malperan bila raweste.

***H.Itidal** (Hunermend):Ev ahenga bi vî rengî ji min re ya yekemîn e. Ez gelekî kêfxweş im. Ev roj li rojnamevanan pîrozb e ,û sipas ji kesên ku, ev aheng li darxistine re

Dûmahîk (r 10)

Viyanana Danezana Şamê(Îlan Dîmeşq) Nîşana berdewamiyê ye

- Memê Alan -

Piştî girtina bi dehan ji giregir û rêvebirên Danezanê , ziyangihandina berjewandiyên hinekan ,û şopandina hinekên dî , gef û gurên jê re bi rêdibûn , û bi sedan vir û vûtên ji aliyê hêzên parastinî yên rijîmê ve li ser dihatin çêkirin û belakirin. Rawestandina çend partî , hêz û kesan endamtiya xwe ji Danezanê , derketina hin kend û astengan li pêş birêvebirina wê çî li vir û çî li wir ; Hişt tirseke rasteqîn derkeve holê û li ba gelek payda bibe , ku belkîm bivebûnek li ser jiyana û hebûna Danezanê hebe , û paşeroja wê jî bi paşeroja buhara Şamê be . Ji ber ku , tekûziyek hebû ku biryara rijîmê biryareke tunekirin û ji holê rakirinê ye .

Rast e hîn ew tirs berdewam e . Lê , piştgiriya bi sedan dewlet , hêzên fermî û ne fermî , komele û komîteyên sêvîl û mafên mirovan , perleman , perlemantêr û kesên bi nav û deng , çî li hundir Sûriyê û çî li derve , bi vê çembera welatî re û bi taybetî bi girtiyan re ; û bi ser de , viyana berxwedan û berdewamiya xebatê li ba endamên wê , hişt ew tirs li cem xelkê sivik bibe . Nimûnakên ku, viyana berdewamiyê diyar dikin ev in :

- 1- Danezaa Şamê di hemî bûyerên hundir û derve de xwedî helwest e .
- 2- Damezrandina komîteyên şaxeyî li derve , û girêdana civatên bi hev re li hundir û derve û di nav de partiya Yekîfî

ya demoqrata Kurd li Sûriyê wek : Civta Landonê di navêna P.Y.D.K s , Tevgera eledalê Welbînai (Enes Elebdê) , û hizib eldîmoqratî elsûrî (Mihyedîn Lazqanî) de , civatên li pêş Waşinton û Biroksêl . digel hevdtinên bi hin dezgehên sêvîl , mafên mirovan û perleman re çêdibin .

3- Hin çalakiyên ku , Danezan pê radibe mîna seredana gora nemir Ibrahim Henano li Helebê Di 17. 4 an de .

4-Lêxwedîderketina Danezanê li biryar , helwest û nêrînên xwe , û bi taybetî erênkirina girtiyên wê ji gef û gur û tenereşandina rijîmê re di riya hin dûvçilkên wê re. Mînak: Dozkirina Rijîmê ji girtiyan - di riya dûvçilkekî xwe re bi navê avokat Muhened El-Hesenî re – ku , bêjin em ne xwediyê daxuyana civata salane ya encûmenê ya Danezanê ne(ji ber ku gelek helwestên ku, tersî berjewandiyên rijîmê tê de ne) . Û li hemberî wê sozdana berdana wan heye . Bersiva wan jê re , em dimînin xwediyê wê daxuyanê û em jê venagerin û tu guftûgo di navêna me û yên mîna te de çênabin .

4- Piştî gelek hevdtinan di navêna Danezanê û hin hêzên dî de û nêzîkbûna baweriyên , hêviya derbasbûna hinekan derdikeve holê .

5- Ev hêviyên çêdibin ne ji xwe berê ne , belê ew ji viyan û baweriyê xurt li ba endamên Îlanê hatiye . Ev viyan jî nîşana berdewamiyê ye

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê
Kurd re yên di girtûgehên Sûriyê de***